Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1119 | 22-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# ‘Bi avakirina civakeke komînal pêşxistina Aboriya Civakî pêkan e’

Vîndar Roj/ Şehba

**Hevseroka Ofîsa Xebatên Koparatîf ya herêma Efrîn û Şehbayê Sofêtlana Ehmed diyar kir ku wan di nava salekê de li herêma Şehbayê 227 pirojeyê koparatîf ji bo civakê pêş xistin e û got, di demên pêş de em ê projeyên koparatîf yên li herêma Şehabyê berfirehtir bikin.**

Li herêma Şehbayê bi rewşa gelê herêmê re yên ku zêdetir koçberên Efrînê lê dimînin, xebatên pêşxistina aboriya civakî hat pêşxistin. Ev xebat bi riya avakirina komêteyeke fermî ku bi xebatê çandinî û pêşxistina pirojeyan di nava gel de dike, hat pêşxistin. Bi armanca destekdayîn û alîkariya welatiyan di hemû aliyan de, ev xebat weke gavên destpêkê hat pêşxistin û heyanî astekê bi ser ket, herwiha gelê herêmê jî bi awayekî kêfxweş ev xebat pêşwazî kir. Bi derbasbûna salekê li ser vê xebatê re, Ofîsa Koparatîn li herêma Şehbayê, bi dirûşmeya ‘Bi giyana aboriya civakî ya koparatîfan em ê civaka komînal ava bikin’ yekemîn civîna rêxistinî ya salê lidar xistin. Girêdayî vê mijarê hevseroka xebatên Koparatîf



ya Kantona Efrîn û Şehbayê Sofêtlana Ehmed ji rojnameya me re axivî.

### Di koçberiyê de pêşxistina aboriya civakî

Sovêtlana diyar kir ku yekemîn car komêtiyek bi vî rengî tê avakirin û wiha got: “Li gorî rewşa herêma Şehbayê ya ku piraniya wê bi çandiyê tê nas kirin û gelê herêmê tenê bi çandiniyê re mijûl dibin, her wiha bi gelê Efrînê re ev yek bêhtir pêş ket û çandinî di herêmê de bêhtir pêşve çû. Weke tê zanîn gelek êriş li ser herêma Şehbayê pêk hatin, ji ber wê jî diviya bû ew erdên ku bê xwedî ma ne ji nû ve bên çandin û di aboriya herêmê de rol bilîze. Li ser van bingehan xebatê pêşxistina aboriya civakî yê koparatîf hat pêşxistin, ev xebat zêdetirî salekê ye bi piroje û alîkariyan li pêşberî gel e. Xebateke bi vî rengî ku ji bo gel bibe alîkariyek yekemîn car e tê pêşxistin. Ji ber vê jî daxwaz û qebûlkirinek ji aliyê gelê Efrîn û yê Şehba ve hat bidestxistin.”

### `227 pirojeyên koparatîf hatin pêşxistin`

Sovêtlana anî ziman ku pirojeyên wan ji 80 ji sedî bi ser ketin û wiha domand: “Bi destpêkirina vê xebatê re me pirojeyên candiniyê bi pêş xistin. Erd û zeviyên herêmê em didin malbatan û di aliyê bizar û alavên çandiniyê de em dibûn alîkar. Di vê sale de me 227 piroje pêşxistin. Ev piroje bi awayekî ji nîvî zêdetir bi ser ketin û bû destek di xuliqandina kar û destkedayîn bi malbatan re.”



### `Xebatên koparatîf xwe disipêra civakeke komînal`

Sovêtlana destnîşan kir ku fikira pêşxistina aboriya civakî xwe disipêre avakirina civakeke komînal û wiha pê de çû: “Pêşxistina pirojeyên koparatîfan bi armancên cuda derket pêş. Di naskirina vê xebatê de, destpêkê civînên berfireh ji gel re hatin çêkirin û tê de ev xebat hat pênasekirin. Di asata yekemîn de rêxistinkirin, hevbeşî û li derdor hev kombûyîn esas hat girtin. Her wiha bi pêşxistina vê xebatê re em rê li ber bazrganiya ji der ve digirin û gel bi xwe berhemên çandiyê ji xwe re peyda dike û him jî ji gelek malbatan re dibe alîkar di dabara jiyanê de. Li ser van bingeh û armancan ev yek tê pêşvebirin.”

### `Pirojeyên pêşesazî wê bên pêşxistin`

Hevseroka Ofîsa Koparatîf Sovêtlana Ehmed anî ziman ku wê di sala nû de piroje û xebatên berfireh bên kirin û wiha got: “Di demên pêş de wê ne tenê pirojeyên koparatîf candinî be, her wiha wê pirojeyên pêşesazî jî bên pêşxistin. Niha em dest bi avakirina firneyekê dikin wê zêdetirî 20 malbatan jê sûdê bigirin. Di heman demê de pirojeya genim wê bê çêkirin. Ya girîngtir herêma Şehbayê di ware kedîkirina lawiran û berhemên lawirvaniyê de li pêş e, di sala nû de emê amedekirina avakirina pirojeyeke ya berhemên lawiran saz bikin.”

# Bi tabloyekê karesata şewatê ya Hemdaniyê xêz kiriye

**Hunermend Nînos Sabit ku bi xwe buye şahidê bûyera şewatê ya Li Hemdaniyê, li ser karasata ku rû da û bi dehan kesan têde jiyana xwe ji dest dan, tabloyek xêz kiriye. Nînos diyarkir ku wî xwestiye bi rêya tabloyekê karesata ku rû daye, xêz bike.**



Di şeva 26’ê Îlona 2023’yan de li bajarokê Hemdaniye ya ser bi parêzgeha Musilê li salonek dawetê de şewat derket. Di encama şewatê de 122 kesan jiyana xwe ji dest dan û zêdetirî 200 kes jî birîndar bûn. Kesên jiyana xwe ji dest dayîn ji baweriya Xiristiyan bûn.

Hunermendê Peykertraş û Şêwekar yê deşta Ninowayê Nînos Sabit ku bi xwe di dema bûyerê de şahidî jêre kir, bi xêzkirina tabloyekê karesata Hemdaniye raxistiye ber çavan. Ninos Sabit di derbarê dema bûyerê û armanca xêzkirina tabloyê de ji ajansa me re axivî.

Nînos Sabit diyarkir ku wê şeva ku bûyer rû dayî, ew bi xwe li wêderê amadebû û got: “Ez li nava wê karesatê de bûm û wek şahidê wê karesatê me. Min gelek kesên ku şewitîbûn dîtin, ez şoq bûm. Destpêkê min wisan zanî ku salon şewitiye û kêmek ziyan gihayê, lê dema hinek nêzîk bûm min dît karesatek mezin rû daye. Min dît ku xelk digiryan, hinek şewitîbûn, hinek ji ber dûkelê xeniqîn. Dîmenek pir bi êş hebû ku di tû filman de jî dîmenek wisan nine.”

Ninos Sabit got: “Piştî bûyerê min biryar da ku tabloyek li ser wê karesatê çêkim. Di du rojên destpêkê yên bûyerê de xelk di nava şoqê de bû. Ez jî bi heman rengî bûm, heta sê rojan min nedikarî ti karekî bikim. Her roj agahiya mirina heval û xizmek me dibihîst. Min di dilê xwe de got, divê ez tiştek li ser vê karesatê çêkim.”

Di dewamê de Ninos Sabit diyarkir ku wî dest bi çêkirina tabloyek bi qebareya 180 santîm dirêjî û 150 santîm firehî kir. Ninos eşkere kir ku wî di tabloyê de rengê zeytê bikaraniye û got, ev tablo behsa karesatê dike, lê wateyek xwe ya taybet heye.

Têkildarî tabloya xêzkirî Ninos got: “Her çiqas dîmenek bi êş hebû, lê ji ber tirsa dîmenan min nekarî êşa mezin a vê bûyerê di karê xwe yê hunerî de nîşan bidim. Ji bona wê min zarokek nexşand ku mûman li tenişta wêneyên wan şehîdan pêdixe. Min bi şêwazê xwe nexşandiye, wêneyê zarok bi meznahî derdikeve û ev tê wê wateyê ku mirov ji hemû tiştekî mezintire. Tişta herî giring di tabloyê de hêmaya hemû pêkhateyane. Her wiha wêneyê bûkê min kişandiye ku li gel xewna xwe ya pembeyî de difire.”

Sudoku: Bersiv 30

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 4 | 7 | 5 | 3 | 6 | 8 | 9 |
| 3 | 7 | 8 | 9 | 6 | 4 | 2 | 5 | 1 |
| 5 | 9 | 6 | 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 7 |
| 6 | 3 | 9 | 5 | 2 | 7 | 8 | 1 | 4 |
| 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 9 | 7 | 6 | 5 |
| 7 | 4 | 5 | 6 | 8 | 1 | 9 | 2 | 3 |
| 4 | 8 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 | 9 | 2 |
| 2 | 6 | 7 | 4 | 9 | 5 | 1 | 3 | 8 |
| 9 | 5 | 1 | 2 | 3 | 8 | 4 | 7 | 6 |

Sudoku:Pirs 31

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 1 | | 9 | | 7 | 6 | | |
| | 2 | 7 | 3 | | 5 | | | |
| 8 | 3 | | | | | | | |
| | 6 | | | | 8 | 4 | | 3 |
| | 4 | | | 9 | | | 5 | |
| 3 | | 5 | 1 | | | | 8 | |
| | | | | | | | 1 | 5 |
| | | | 5 | | 1 | 9 | 7 | |
| | | 3 | 2 | | 9 | | 6 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ji sed cihî birîndar im, êdî nikarim bejim sax im:**
- Rewşa min pir xirab e; derdên min pir in.
**Li ber piyan çû/li ber lingan çû:**
- Ti kes lê xwedî derneket; ji bêxwedîtî wisa lê hat.
**Ne Îsa li me bû xwedî ne Mûsa:**
- Dema mirovek dikeve tengiyê û ti kes lê xwedî dernekeve hingê tê gotin.
**Weke peza ji kerî qetiyayî:**
- Rê lê winda bûne; nizane ka çi bike.
**Yê şemitî şewitî:**
- Dostên ketiyan nînin; kesê şepirze dibe ti kes destê wî nagire.
**Agir di nava wî de ye:**
- Pir bilez e; bendewar e.
**Bi destê lezê:**
- Pir bilez; bi lezgînî.
**Berûya qûna bizinê ye:**
- Kesê pir lezê dike û dixwaze kar berî dema xwe bibe, ji bo wî tê gotin. (2)
**Berûya zarê bizinê ye:**
- Bi heman wateyê.
**Di nava xwe de diqiçqiçe:**
- Bi heman wateyê.
Ji cotkar re gotin; ew çi ye tu diçînî,
**got dema şîn bibe tuyê bibînî:**
- Lezê neke, wê pişt re diyar bibe; xwe bigire, dema biqede tuyê bibînî.
**Li ser agir e:**
- Bi heman wateyê.
**Ma tu hatî agir:**
- Tu çima lezê dikî?
**Ma tu hatî nanê deyn:**
- Bi heman wateyê.
**Şkeva lê xist:**
- Pir lez kir; sebir nekir.

**LÎ SER REXNE, GAZIND Û KÊMAYIYAN**

**Agir bi malê keto:**
- Dema pêwîst be yek tiştekî bike û neke hingê jê re tê gotin.
**Ava reş bi çavê min de hat:**
-Çawa min nedît?
**Ava reş li çavê min hat:**
- Bi heman wateyê.
**Berê kevirên xwe da min:**
- Ez rexne kirim; li dijî min axivî.
**Çavê min reş bû:**
- Çawa min nedît?
**Dinya telekî (xwar) nabe:**
- Ku tu qenciyekê bikî tiştek naqewime.
**Ez nikarim ber te ve bibezim:**
- Ez nikarim li dû te bigerim; ez nikarim bi hawara te ve werim; ez nikarim pirsgirêkên te çareser bikim; ez êdî nikarim alîkariyê bidim te; ez bi te re nagihînim.
**Ez nikarim bi te re bibezim:**
- Bi heman wateyê.
**Erêê, erê. Heft birayên min hebûn ez şandim kerê:**
- Ti kes ti karî nake bi min didin kirin; her tişt di stûyê min de dimîne.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Pêwîste ku jin xwe ji sîstemê qut bike



Endama Komîteya Rêveber a PKK’ê Hêlîn Umît got, “Şert e ku jin ji sîstemê qut bibe û xwe bi rengekî cuda bi rêxistin bike. Jin çiqasî xwe xweser bike, ewqasî xwe, zayenda xwe nas dike, dibe xwedî îrade”. **R-3**

## Şehîd Îsam di meşa çapemeniyê de bû çira azadiyê



Şehîd Îsam Ebdullah şeva 20’ê Mijdara 2022`an de, hemû metirsiyan li ber çavan girt û ji bo belgekirina sûcên dewleta Tirk a dagirker di bin bombebaraneke dijwar a hewayî de ber bi gundê Teql Beqlêyê girêdayî navçeya Dêrikê ve bi rê ket û di dema belgekirina komkujiya Dêrikê de şehîd bû.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1119 | 22-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# RONAHÎ TV DENGVEDANA ŞOREŞÊ Û ÇAVKANIYA BAWERIYÊ YE

Di 21’ê Mijdara 2012’an de Ronahî TV dest bi weşana xwe kir û damezrandina yek ji kenalên satelaytê yên navdar di warê şopandin û ragihandinê de 12 sal temam kirin. Ji destpêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê û heta niha, Ronahî TV erka ragihandina pêşketin û heqîqeta şoreşê ji cîhanê re girtiye ser milê xwe. Tevî hemû êriş û zextan jî Ronahî TV bi keda karmendên xwe bûye dengê civakê û şoreşa gelan.**R-5**







## ‘Hemas li gorî berjewendiyên dewleta Tirk û Îranê tevdigere’

Hevserokê Partiya Kesk a Demokrat, Luqman Ehmê da zanîn ku Pirojeya riya aborî ya Hind- Ewropa ku di Israyîlê re derbas dibe nakeve xizmeta berjewendiyên aborî yên dewleta Tirk û Îranê de û ji bo ku rê li pêşiya wê bigrin Hemas weke amûrekê bikar anîn.**R-4**

## Zarok hêviyên siberojê ne



Roja cîhanî ya zarokan di sala 1857’an de li Çêlis, ji hêla 160 Dewletan ve hate îmzekirin. Bi armanca parastina mafên zarokan yên rewa, û dûrxistina wan ji hemû helaketên heyî.**R-2**



## Helbestvanê ku bi helbestê re çavê xwe vekir û mezin bû

Ebûdê Mexso yek ji romannivîs û helbestvanên Rojava yê ku ji temenê zaroktiyê ve helbestên xwe bi xeyalekî kûr dinvîsîne. Mexso xwediyê 5 dîwanên helbestan û nivîskarê Romana Qelen a ku li ser jiyana kurdperwer Yûsif Gulo hatiye nivîsîn.**R-7**

Nehîr pale
Tûndî kuştina nirxên madî û manewî ye R-2


Farûk Sakîk
Qedexekirina PKK’ê R-5


Kemal Necim
Kêmbûn û paşdemayîna xwendina pirtûkan... çend têbînî R-7

# Zarok hêviyên siberojê ne

Roja cîhanî ya zarokan di sala 1857'an de li Çêlis, ji hêla 160 Dewletan ve hate îmzekirin. Bi armanca parastina mafên zarokan yên rewa, û dûrxistina wan ji hemû helaketên heyî.

**Deriya Çiya/Qamişlo**

Roja cîhanî ya zarokan di yekşema duyem a sala 1857'an de ji aliyê Rivernd doktor Çarlis Leonerd û keşeyê Kilîsê Unîver Salistî li Çêlis ve hate diyarkirin. Çarlis Leonerd xizmetek taybet ji bo zarokan dikir, destpêkê navê vê rojê, roja yekşema gul bû, piştre navê wê kirin roja cîhanî ya zarokan. Derbarê roja cîhanî ya zarokan de û rewşa wan a niha, Rêvebera Komîteya Şilêr a Zarokan Nisrîn Ismet wiha ji rojanameya me re axivî.



**Tundiya li ser zarokan berdewame**

Nisrîn Ismet Rêvebera Komîteya Şilêr a Zarokan, derbarê roja cîhanî ya zarokan de wiha axivî: "Bi zagonên ku ji aliyê 160 dewletan ve hatiya imzekirin mîna roja cîhanî ya zarokan hate pejirandin û têde tekeziya mafên zarokan hate kirin da ku zarok nema rastî tundiyê werin. Lê ji ber ku em dibînin ev demeke dirêje li ser vê imzekirnê re derbasbûye, lê heyanî roja me ya îro rojane em dibînin ku zarok dibin qurbaniyên van êrîşan". Bi taybet em dikarin bibêjin ku tûndiya li ser zarokan ji malbatê dest pê dike heya ku dighêje tûndiya sistemên serdest yên ku bi hişmendiya netew dewletê li ser civakê tevahî siyaseta çewsandinê didine meşandin. Di roja me ya îro de bêtirî xwe jin û zarok dibin qurbaniyên şer, şidet û tûndiya ji milê hişmendiya dewlet netew û sistemên kabtalîst yên ku li ser civakê têne meşandin û heyanî roja îro jî ev tûndî berdewam e.

**Rewşa zarokan li herêmên dagirkirî**

Nisrîn Ismet diyar kir ku li herêmên dagirkirî rojane zarok rastî tecawiz, kuştin û revandinê tên û weha dewam kir: "Ev kiryarên ku li herêmên dagirkirî derketine holê, û rojane li ber çavan têne dîtin, ji bo me pir bi êşin. Kesên ku cihên xwe li wan deverên dagirkirî digirin, kesên girêdayî dewleta tirkin û derfetê nadin dezgehên ragihandinê, Saziyên Mafên Mirovan û saziyên ku mijarên zarokan dişopînin ku derbasî wan deveran bibin. Kiryarên ku rojane li herêmên dagirkirî pir dibin sedemê ew e ku derfet nayê dayîn ji bona sazî, dezgehên girêdayî mafê zarokan derbasî wan deveran bibin û rewşa heyî bişopînin û ji raya giştî re ragihînin. Dagikeriya tirk bi êriş û kiryarên xwe jî metirsiyekî pir mezin xistiya dilê malbatan, da ku bi rihetî êrîş û kiriyarên xwe bimeşînin bê ku malbat wêrîbe tiştekî biaxive. Agahiyên heyî jî bi rengekî veşartî, bidizî û bizehmetiyeke mezin dikevin destê me, lê rewşa heyî gelekî xirabe û gelek kiryarên dagirkeriyê veşartî û di tariyê de dimîin, ji ber ku kesê ku biaxife û bêje wê were kuştin û girtin.

**Bandora şerê taybet li ser zarokan**

Nisrîn Ismet bal kişand ser bandora şerê taybet li ser zarokan û wiha got: "Ji bilî şerê çakdarî û bumbebarana ku rojane li ser serê civakê tê meşandin, bi gelek rêbazên şerê taybet jî ev yek di serî de li ser jin, zarok û ciwanan tê meşandin û gelek zarok dibin qurbanê vî şerê qirêj û gemar. Herwiha li ser civakê bombebaraneke dijwar ya şerê taybet û derûnî tê meşandin û dagirkeriya tirk di vî warî de her tiştî ji bona xwe mubah dibîne û bi belavkirina madeyên hişber, fihûş û koçberiyê dixwazin li ser civakê qirkirineke çandî û hişmendî pêkbînin.
Karkirina zarokan di temenê biçûk de, zewaca temen biçûk, tecawizkirina zarokan û bi zarokan ve nemijûlbûn û ew ji derfetên xwendinê bê par hiştin beşek ji tûndiya ku li ser zarokan tê meşandin e.
Gelek caran di mesela zewaca keçan ya di temenekî biçûk de destê mapbatê têde hye û ew jî hevkarên vî sûncî ne û pêwîste ku malbat di vî warî de werin hişyarkirin û perwerdekirin. Herwiha ji bo bikaranîna zarokan di temenê piçûk de li cihên wek, sînaha û sûkên şênî û li cihên karên giran wek ajontina alavên mezin ku ne li gorî temen û bedena zaroka ne jî têne kirin û bandora vê yekê bi rengekî neyînî li ser zarokan dike. Tevlîbûna zarokan ji van karan re dibe sedem ku ew ji jiyana zarokan qutbibin û ev yek bandoreke neyînî li ser derûniya wan dike û ew ji nava hevalên xwe û ji dibistanê qutdibin û heyanî temenekî mezin jî bandora vê yekê li ser kesayeta wan dike.

**Hewildanên xwedî derketina li zarokan**

Nisrîn Ismet Rêvebera Komîteya zarokan a Şilêr, di dawiya axaftina xwe de got ku:" Herçiqasî ku 160 dewletî li ser zagonên parastina zarokan imze kirine jî, lê ev yek tenê di warê gotinê de dimîne, ji ber ku kes li mafê zarokan xwedîdernakeve û kiryarên ku dijî zarokan têne kirin tev bê bersiv dimînin. Ji ber vê yekê rewşa ku zarok têde dijîn ji bona me pir bi êş e, û pêwîste ku li ser were seknandin û derbaskirin û xwedî li mafê zarokan were derketin. Îro em komîteya Şilêr a şopandin û parastina mafên zarokan hewildidin ku kiryarên ku li dijî zarokan têne meşandin bişopînin, belgebikin û bighînin aliyên peywendîdar û xwedî li mafê wan derkevin. Herwiha em bi hêvî ne ku hemû saziyên navnetewî, heremî û kesayetên ku bi parastina mafê zarokan ve mijûl dibin dest bidin hev û ji bona parastina mafên zarokan û siberojeke serkeftî û biewle hertim di nava kar û xebatê de bin.

# 'Jin ji bo aştî û aramiya siyasî xwedî roleke mezin e'

**Ronahî/Qamişlo**

**Hevseroka MSD`ê Canda Remo diyar kir ku bi belavbûn fikr û ramanên Rêber Apo, wekî tevahiya qadan jinê dikarîbû di qada siyasî de jî bibe pêşeng û got, piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê jinên bakur û rojhilatê Sûriyê di qada siyasî de roleke mezin lîstin û bûn pêşeng.**

Ji 5 hezar sal û vir de ji dema avakirina pergala baviksalarî ya ku ji bo berjewendiyên desthilatdaran hat avakirin, rastî û pênaseya rast a civakê jî bi vê yekê re hat wendakirin. Her wiha rol û misyona jinan a ku her tişt di civakê de afirandiye û civakbûn bi pêş xistiye bû hedefa mêr. Pergala zihniyeta baviksalar ji bo civakê bixe bin xizmeta xwe destpêkê dest avêt nirxên jinê. Ji ber ku ger vîn û rola jinê di civakê de lawaz be, yekser civak dikeve xizmeta desthilatdaran de. Lê piştî 5 hezar sal bi destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re, ew pergala baviksalar di civakê de lawaz bû. Bi vê yekê re rol û misyona jinê û pênaseya rast a jinê derket pêş û êdî hemû çareserî bi destê jinê ne. Wekî tevahiya qadan, jinê di qada siyasetê de jî bû xwedî gotin û rola xwe lîst. Derbabê rola jinê di qada siyasî de



Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk MSD`ê ya Kantona Hesekê Canda Remo ji rojnemeya me re axivî.

Canda Remo da zanîn ku beriya derketina tevgera azadiye jin di rewşeke bê mafî û ne edaletê de mabû û wiha got: "Jin di pêvajoya tundî û temisandina nav û xwezaya xwe de derbas dibû, lewma tu carî li Rojhilata Navîn dengê jinê nehatibû derkrtin. Bi taybet dengê jina kurd, her wiha piştî şoreşa Rojava derfetekî pir mezin da jinan, ku guhertinek e cidî di rewşa xwe de pêk bîn e. Me dît çawa jinan dikarîbû xwe di hemû beşên jiyanê de ifade bikin û rola xwe ya girink bilîzin, ev jî bi pêşxistina aliyê perwerde , şopandin û lêkolînê de me dikarîbû ferq û cudahiya zanebûn û rola jinan bibînin. Beriya Şoreşa Rojava gelek jin tenê karê malê dikrin û zarokên xwe xwedî dikirin. Jinên Sûriyeyî gelek berdêl dane. Jin li herêmên di bin kontrola rejîmê de hîn jî ji gelek mafên xwe mehrûm in û rastî gelek zehmetiyan tên. Ez hêvî dikim ku pêşketinên jin li herêmên bakur û rojhilatê Suriyê pêk anîn, li tevahiya erdnîgariya Sûriyeyê jî pêk were."

**'Jinên bakur û rojhilatên Suriyê bûn mînak ji cîhanê re'**

Canda wiha berdewamî da axaftina xwe û got: "Bi belavbûn fikr û ramanên Rêber Apo sedema herî bi wate û girîng ew bû ku jin karîbû sûdeke mezin ji fikr û ramanên Rêber Apo bigre, her wiha bi roniya vê felsefê rêka azadiyê afirand û ronî kir. Jin di hemû qadan de cih girt, yek ji wan qadan de jî qada siyasî ye. Wek em dizanin ku beriye şoreşa Rojava, jin hatibû tunekirin û di civkê de hatibû çewisandin. Îro em dibînin çawa jin bi hêza xwe ya siyasî dikare bajar û welatan bi rêve bibe û di qadên diplomasî de rola xwe ya giring dilîzin, her wiha jinên li bakur û rojhilatê Suriyê bûn mînek ji tevahî jinên cîhane re."

**'Jin di qada siyasî de gelek sîorên li dijî wê şikand'**

Canda tekîz kir ku qada siyasî qadeke di dîroka mirovahiyê de li ser navê zilam bû û wiha got: "Di dîroka dewletan de, tenê zilam munasib didîtin ku di qadên siyasî de kar bikin. Lê jina kurd ev sînor şikand û di nava civaka xwe de weke sembola jiyanê tê nirxandin. Zemîna ku jina kurd niha avakiriye zemîna parastina mafên jinan yên siyasî ye, di heman demê de parastina jinan di civakê de. Jina kurd dikarîbû tevahî sînorên xirab bişkîne û deriyê siyaseta ku di rûyên jinan de girtî bû veke, da ku jin bikaribe bi awayekî wekhevî û azad xwe ifade bike."

**'Divê jin rola xwe bilîzin'**

Hevsroka Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê a Kantona Hesekê Canda Remo di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Pêwîste hemû jinên Sûriyeyê ji bo beşdarbûna di pêvajoya siyasî û dîplomatîk de xwe amade bikin, gelek jin hene ku dikarin vî karî bikin lê pêwîstiya wan bi piştgiriya me heye. Jin ji bo aştî û aramiya siyasî li herêmê xwedî roleke mezin in. Divê em ji bo jinên ku di siberojê de me temsîl bikin, bibin destek. Ji ber vê pêwiste hemû jin xwe di asteke mezin de binirxînin û tekoşînê bidine meşandin da ku bibin xwedî maf di qadê jiyanê de ne tenê di aliyê siyasî de."

## Ji Pênûsa Jin

### Tûndî kuştina nirxên madî û manewî ye

Nehîr Pale

Li hemberî jin tûndî meşandin têkiliya xwe bi zîhniyetê re heye. Tenê weke bertekekê pêşnakeve. Tûndiya siyasî, fêzîkî, piskolojîk û aborî li hemberî jinê tê meşandin. Diyardeya tûndiyê dibe ku ne bi malbatê re pêşketibe, destpêkê ji saziyên dewletê dest pê kiriye. Ji aliyê desthilatdaran ve fêzîka jin ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîne rêbazekî herî qirêj ê tûndiyê ye. Ji dema 3500 BZ Someriyan destpê kirine fêzîka jinê dane bi kar anîn û di rêvebirina civakê de dor lê teng kirine, ango hemû berhemên wê ji dest girtine û kirine bin xizmeta berjewendiyên xwe de. Êdî pêvajoya şehristaniya Someriyan ji bo jinê şikandina yekemîn tê pênase kirin û tûndiya herî dijwar ji wê demê dest pê kiriye. Jin weke fahîşe dayîna bikar anîn tûndiyeke siyasî, fêzîkî û piskolojîk e.
Malbat jî weke saziyeke dewletê bûye sedema şideta fêzîkî û piskolojîk a li ser jinê tê meşandin asayî bibe. Ev tûndiya li hemberî jinê tê kirin di bin navê exlaq û zagonên civakê de tê kirin û herî zêde di bin navê ol de tê kirin.
Zîhniyeta cinsiyetparêz rewa dike û temenê wê dirêj dike. Êdî li ser asta kes, malbat û civakê eger mêr tûndiyê li hevjîna xwe neke ew ne mêr e. Destdirêjî li jinê kirin, pir zewacî û îxanet lê kirin ji mafê mêr tê dîtin û kesek hesab jê naxwaze. Di vir de mulkiyet jî yek ji sedemên ku tûndî li jinê tê kirin. Civak li beramberî tûndiya li ser jinê bêdeng û bê helwest dimîne ji ber guneh an heram nabînin, ew maf daye mêr ku hemû teşeyên tûndiyê li ser jinê bide meşandin. Eger tûndî bighîje asta ku bav destdirêjî keçên xwe bike, yan jî bira destdirêjî xwişka xwe bike, wê demê civak vê yekê guneh û heram dibîne û daxwaze cezakirine dike, dîsa jî xwe nade ber berpirsyartiya exlaqî û manewî ya civakê û hesab naxwaze. Civak li bendê dimîne ku dewlet hesab bixwaze ango ne tenê jin bê parastin maye her wiha hemû nirxên madî û manewî yên civakê bê parastin mane û kesek berpirsyartiya wê ranake. Ev jî dibe sedema ku diyardeya tûndiyê hîn kûrtir bibe û bighîje asta ku ziyanên mezin bide civakê.
Tûndiya siyasî jî ku li ser jin û civakan tê meşandin ji sedsala nehemîn û dehemîn li Rojhilata Navîn û giştî cîhanê dest pê kiriye. Di sedsala 19'mîn û 20'mîn de gihîştiye asta ku bibe rêbazekî li hemberî civakan were bikar anîn. Di encama tûndiya siyasî de komkujî li ser civakan hatine kirin. Mînaka wê komkujiya Dersim, komkujiya Ermeniyan, qirkirina Kurdên Êzidî û hwd. Niha jî di encama tûndiya siyasî de gelê Filistînê di qirkirinê re derbas dibe û sedema wê Hemas, Israîl û Tirkiyê ye.
Şerên ku bi destê deshilatdaran têne kirin bûne sedema ku diyardeya tûndiyê kûrtir bibe û civakê berbi hilweşînê ve bibe. Civak û bi taybet jin eger xwe birêxistin nekin û nikarbin xwe biparêzin wê mîna pez rastî komkujî û qirkirine werin.



# Helbestvanê bi helbestê re çavê xwe vekir û mezin bû

Ebûdê Mexso yek ji romannivîs û helbestvanên Rojava yê ku ji temenê zaroktiyê ve helbestên xwe bi xeyalekî kûr dinvîsîne. Mexso xwediyê 5 dîwanên helbestan û nivîskarê Romana Qelen a ku li ser jiyana kurdperwer Yûsif Gulo hatiye nivîsîn.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Helbestvan, romannvîs û rewşenbîr Ebdilmecdê Mexso bi navê Ebûdê Mexso tê naskirin, ew di sala 1966'an de li gundê Dawidiyê ya girêdayî bajarokê Amûdê ji dayik bûye. Wî xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe û Bîrziravê xwendiye û ya navîn jî li Hesekê û Qmişlo qedandiye.
Di sala 1981'ê de, wî xwe bi xwe fêrî nivîsandin û xwendina bi zimanê kurdî kirye û dest bi nivîsandina helbestê kiriye. Herwiha ji wê demê ve li bajarê Qamişlo dimîne. Piştî xwendina amadeyî bidawî dike, derbasî peymangeha amadekirina mamosteyan dibe û tê de beşê taybet ya Perwerdekirinê dixwîne. Lê ji ber encamê karê siyasî di sala 1987'an de ew ji aliyê hikumeta Şamê ve ji peymangehê tê dûrxistin. Herwiha di sala 1989'an de hikkumeta Şamê bi hinceta ku Mexso karê siyasî û têkiliyan bi Tevgera Rizgariya Kurdistanê re dike, êrîşî mala wî kir û 37 helbestên wî jê standin.

Ebûdê Mexso ji bilî nivîsîna helbestê di gelek kovar, rojnaname û malperan de dinivîsîne. Hêjayî gotinê ye ku ew beşdarî gelek şevbihêrkên helbestî û festîvalan jî bûye; weke Pêşangeha Şehîd Herekol, fastîvala Osman Sebrî û hwd... . Di heman demê de jî Mexso yek ji damezrînerên Pêşangeha Şehîd Herekol ya pirtûkan e û niha jî hevserokê Yekîtiya Rewşenbîran e.

**5 dîwan çapkirine**

Ebûd Mexso ji zaroktiya xwe ve kar û xebatek bêhempa di warê nîvsa bi zimanê kurdî de daye meşandin û gelek berhem dane çapkirin, heta niha jî jimara dîwanên wî yên hatine çapkirin gihiştiye 5'an û wihane;
-Kulîlkên Zozanan di sala 2016'an de hat çapkirin.
-Vîn û Viyan di sala 2018'an de hat çapkirin.
-Xemla welêt, di sala 2020'an de hat çapkirin.
-Zindana evînê di sala 2022'yan de hat çapkirin.
-Çavkaniyên jiyanê di sala 2022'yan de hat çapkirin.
-Pirtûka Romana Qelen di sala 2023'yan de hat çapkirin.

**Xelat**

Ebûd Mexso heta niha ji bo ked û xebata xwe ya di warê rewşenbîriyê de gelek xelat wergiritine, herwiha xelatên ku wergirtine jî ev in:
-Xelata Tevgera Civaka Demoqrat(TEV-DEM) 2016.
-Xelata Desteya Çandê ya herêma Cizîrê 2019.
-Xelata salane ya Seydayê Tîrêj ya herêma Cizîrê 2022.
-Xelata Yekîtiya Rewşenbîrên herêm Cizîrê 2022'an de.
-Xelata Desteya Çandê û Dîwana Wêjeyê ya pêşbirka Helbestê ya fastîvala Osman Sebrî 2023.
-Xelata şêwekar Wehîd Hiso ji bo Romana Qelen 2023.
Ebûd Mexso girêdayî jiyana xwe, nivîsîna helbest û romana Qelen ji rojnameya me re axivî.

**Min ji xwe pirsî, çima ne bi kurdî?**

Mexso têkildarî helbestê di qonaxa zaroktiya xwe de wiha got: "Di qonaxa zaroktiya xwe de ez ne mîna zarokên gundê xwe bûm. Piraniya caran ez bi tena xwe dimam, li çol û derdora gundê Dawidiyê digeriyam. Min wê demê jiyana xwe ya taybet ku helbest û sitranan dagirkiribû, bi vî rengî diborand. Ji ber vê yekê jî malbata min û gundiyan tevan navê Ebûdê Dîn li min kirin, gihatş astekê ku ez neçar kirim ku min bibin gel şêx û melayan jî, lê ez ji xwe re bi wan dikeniyam. Piştî ku ez hatim Qamişlo ez derbasî çand, jiyan û civakeke nû bûm, jiyana min a li gund gelekî ji ya bajar cuda bû, li gundê me her tişt bi kurdî bû. Lê li bajêr ez diçûm dibistana erebî û qedexe bû ku em kurd bi zimanê xwe biaxivin. Wê demê ez hişyar bûm û min ji xwe re got, çima ne bi kurdî?. Di wê demê de ez di maleke kirê de bûm û kurê wê malbata ku ez lê bûm, mamoste bû û Dîwanên Cegerxwîn li gel wî hebûn. Dema ku ji mal derdiket jî, min ew dîwan bi dizî tanîn û min bi riya wan xwe fêrî zimanê kurd kir. Herwiha piştî ez fêrî nivîsîn û xwendina zimanê kurdî bûm min hemû helbestên xwe yên ku li gund digotin, nivîsandin. "

**Helbest ji bo Ebûd Mexso koka felsefeyê ye**

Ebûd Mexso di derbarê helbest û nivîsîna wê de wiha anî ser ziman: "Helbest ji bo min koka felsefê ye û çi kesayetên ku bûne feylesûf, ji helbestê dest pê kirine. Helbestvan xwedî taybetmendiyekê di nav xwe de dihewîne ku xwedî hestên nizm û tenik in. Herwiha çi bûyera ku li pêşiya helbestvan çêdibe, bandorê lê dike û dike helbest. Ez jî wiha me ku dighêje astekê, ez ji ber helbestê rondikan dibarînim. Di 18'ê Adara 1985'an de, bi boneya pîrozkirina şeva Newrozê, min li bajarê Hesekê di ahengeke fermî de helbesteke xwe li gel Salihê Heyîdo û nemir Seydayê Tîrêj, xwend. Kêfa wan gelekî ji helbestên min re hat û wê demê Seydayê Tîrêj ji min re got"Ger hin kesên mîna te bi zimanê kurdiya latînî dinvîsin wê hertim zimanê kurdî bimîne parastî." Ez hezkiriyê helbestê me bi taybet helbesta kilasîk a li ser pêlawazan, min dîwana xwe ya dawî jî tev bi terzê kilasîk nivîsandiye û di fastîvala Osman Sebrî ya 7'emîn di asta 2'an de derket. Mijarên helbestên min li ser welat, şoreşên kurdan,



şehîd, dijminên kurdan, Seydayê Cegerxwîn, YPG'ê YPJ'ê, Gerîla û hwd… in. Niha jî 5 dîwanên min yên helbestê hene û dîwaneke din bi navê Pêlname wê were çapkirin. Herwiha ez li ser pirtûkeke din jî kar dikim û wê naveroka wê li ser rola rewşenbîran di Şoreşa Rojava de be."

Qelen berhema guncaw ji bo pesindayîna Apê Yûsif e

Romannivîs Mexso girêdayî nivîsîna romana xwe ya bi navê Qelen wiha axivî: " Ez û Yûsifê Gulo ji salên 80'î ve ji nêz ve em hev nas dikin. Pirî caran min pirsgirêk û êşa civaka xwe jê re digot û ew cihê çareseriyê bû û di heman demê de gelek caran ez di mijarên taybet de bi wî dişêwirîm. Apê Yûsif kurdperwerek bû, mala Gulo tev jî di pêşveçûna Şoreşa Rojava, herwiha Tevgera Rizgariya Kurdistanê de xebateke bêhempa dane meşandin. Roja ku şehîd ket ez gelekî hestiyar bûm, ez ghaştim ser cihê ku lê şehîd ketî, tucaran ev bûyer ji bîra min naçe û her gava ku tê bîra min ez hêsran dibarînim. Şehadeta Apê Yûsif gelekî bandor li min kir û min gelek helbest li ser wî nivîsand, lê min dît ku ez nikarim bi helbestê maf bidimê. Lewma min roman weke bênvedaneke derbirînên xwe ji bo nivîsandin ked, xebat û kurdperweriya Yûsifê Gulo pejirand. Herwiha ,min berhema xwe ya yekem e bi navê Qelen weke rêzdarbûyîn û giranbuhabûna şexsê Apê Yûsif piştî du salan da çapkirin. Di heman demê de vê romanê coşek da min û deriyê nivîsîna romaneke din li pêşiya min vekir. Niha jî ez dihizirim ku romanekê bi giştî li ser Şehîdên Kurdistanê binvîsînim. "

# 'Di her tabloyekê peyamek cuda hate dayin'

Şêwekarên ku beşdarî 1'emîn pêşangeha wêneyan a li Kobanê bûn, qala wateya tabloyên xwe kirin û wiha gotin: "Di her tabloyekê de peyamek cuda heye."

Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û ji aliyê Hîlala Zêrîn ve 1'emîn pêşengeha wêneyan li bajarên Tebqa, Reqa û Minbicê hate lidarxistin. Piştî ku li van bajaran pêşangeh bi dawî, ev car li Kobanê pêşengeh hat lidarxistin. 26 şêwekar bi 48 tabloyan beşdarî pêşangehê bûn. Şêwekar têkildarî wêneyên ku çêkirine, ji ANF'ê re axivîn.
Şêwekara bi navê Îlham Mihemed Îsa diyar kir ku ew beşdarî bi dehan pêşengehan bûye û wiha got: "Lê ev



pêşangeh ku ji aliyê Kevana Zêrîn ve hatibû destpêkirin, min jî wek jinekê xwest bi tabloyên xwe têde cih bigrim. Bi sê tabloyan ez beşdar bûm. Yek kaniya Kurdan, çanda Kurdî û qada jina azad ku di wê qadê de jin azadiya xwe diyar dike, min xwest ez neqiş bikim."
Şêwekara ji bajarê Reqayê Emel Etar jî anî ziman ku wê xwest bi tabloyên xwe peyamekê bigihînim civakê û got: "Tabloya min li ser dayîka şehîd diaxive, hêsrên wê, berxwedaniya wê di her warê civakê de nîşa dike. Peyama min di vê tabloyê de ew e ku em gelekî berxwedêr in."
Şêwekara ji bajarê Tebqayê Seher Ebdilrehmen jî ev tişt got: "Ez bi du tabloyan tevlî bûm; min bi jin û zeytûn wêneyek neqiş kir û têde aştî diyar kir, ya din jî li ser zewaca zarokên biçûk. Wêne ji bo min jiyaneke cuda ye, ji zarokatî heta roja me ya îro weke rêhevalekî ye. min di gelek pêşengehan de bi tabloyên xwe reng û reng cih girtiye."
Şêwekara bi navê Fatma Colo jî got min bi rengê jina aştiyê wêneya xwe neqiş kir û got: "Wêneya min li ser aştî, hezkirinê û jina azad hatiye neqişkirin. Di nava wê de jî cil û bergên Kurdî min neqiş kiriye. Di her tabloyê de jî peyamek û hestek cuda heye."

## Têbînî



### Kêmbûn û paşdemayîna xwendina pirtûkan… çend têbînî

Kemal Necim

Di salên dawî yên sedsala 20'an de mijara kêmbûn û paşdemayîna xwendina pirtûkan kete rojeva civakên gelek welatên cîhanê. Der barê sedemên siyasî, civakî, aborî û derûnî yên vê rûdanê zanyar û sosyologên van welatan jî têra xwe lêkolîn kirine û hewil dane ku rê û rêbazên têvedana ber bi xwendinê de destnîşan bikin.
Carna dihate bîra hin rewşenbîrên Kurdî jî ku pirseke wiha arasteyê civaka Kurd bikin û bêjin; gelo çima xwendina bi zimanê kurdî kêm e û paşde maye. Weke ku Kurd xwedî dewlet û statu ne û perwerdeya wan bi zimanê dayikê ye û salane bi hezaran pirtûk têne çapkirin û weşandin. Bê guman civaka kurd jî her beşek ji civaka vê cîhanê ye, lê arastekirina pirseke wiha di wê demê de li bejna civaka kurdan nedihat. Pirsa ku pêwîst bû bihata kirin ew bû; kanî pirtûkên Kurdî, kanî civaka ku bi kurdî dixwîne û dinivîse, kanî weşanxaneyên Kurdî .. hwd.
Her çiqasî ji destpêka sedsala 20'an û vir ve li Başûr û Bakurê Kurdistanê tevgera çap û weşana bi zimanê Kurdî geş bûbe jî, lê wê geşbûnê tîrêjên xwe nedane Rojava, ji xwe sedemên wê jî diyar in.
Ji sala 2012'an ta niha, li kêleka hemû geşedanên ku bi şoreşê re li vî parçeyê welêt pêk hatin, tevgera xwendin û nivîsîna bi zimanê kurdî, çap û weşana bi zimanê kurdî jî geş bû û gavên girîng avêtin.
Ango em dikarin bêjin ku pirsa; kanî pirtûkên kurdî, kanî civaka ku bi kurdî dixwîne û dinivîse, kanî weşanxaneyên kurdî, ji holê rabûn. Lê di rewşeke wiha de, em dîsa nikarin bêjin ku xwendina bi zimanê kurdî paşde maye, çima? Ji bo ku tiştek paş de bimîne, pêwîste destpêkê li pêş be yan pêşketî be, da ku em piştî demekê bêjin wa li paş maye. Lewma tişta ku pêwîste têkeve rojeva civaka kurdî ewe ku em ê çawa civakê toşî xwendinê bikin. Ji bo ku em karibin civakê têvedin xwendinê pêwîste destpêkê tiştên ku bêne xwendin hebin, ango pirtûk bêne nivîsîn, pir bibin û berdest bibin.
Di rewşa heyî de, li Rojava salane bi sedan pirtûkên nû têne çapkirin û weşandin, her wiha pirtûkên li deverên din ên Kurdistanê jî berdest û peyda dibin. Lê li gorî ezmûnên çend salên derbasbûyî, peydabûna pirtûkan li pirtûkxaneyan nebû egera ku civakê têvede xwendinê. Lewma pêwîste ku hin rê û rêbazên din peyda bibin ku pirtûk berdestî beşekî berferh ê ciakê bibe.
Li gorî çend ezmûn û çavdêriyan, lidarxistina çalakiyên danasîna pirtûkan, ahengên imzekirin û belavkirina pirtûkan, civatên xwendin û nirxandina pirtûkan, rêbazên pir bi bandor in û bala beşekî berfereh ê civakê û xwêneran dikşîne. Lê ev çalakî her bi sînor û teng dimînin, piranî li bajarên mezin û di nava civaka teng a rewşenbîran de asê dimîne, heme bêje heman kes her çarê li wan çalakiyan amade dibin.
Lewma ji bo ku qada peydabûn û belavbûna pirtûkan berferh bibe, pêwîste qada van çalakiyan jî berfereh bibe. Pêwîste çalakî û aheng û civatên wiha li hemû beşên zanîngehan, li dibistanan û navendên bajaran û carnan jî li gundan bêne lidarxistin.

# Şehîd Îsam di meşa çapemeniyê de bû çira azadiyê

Şehîd Îsam Ebdullah şeva 20'ê Mijdara 2022`an de, hemû metirsiyan li ber çavan girt û ji bo belgekirina sûcên dewleta Tirk a dagirker di bin bombebaraneke dijwar a hewayî de ber bi gundê Teql Beqlêyê girêdayî navçeya Dêrikê ve bi rê ket û di dema belgekirina komkujiya Dêrikê de şehîd bû.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di 20'ê Mijdara 2022'an, nûçegihanê Ajansa ANHA'yê Îsam Ebdulah dema ku berê xwe da gundê Teqilbeqlê ji bo ku bi kamireya xwe sûcên dewleta Tirk a dagirker tewsîq bike, ji aliyê dagirkeriyê ve hat hedefgirtin û şehîd bû.

Derbarê salvegera şehadeta rojnemevan Îsam Ebdullah, Edîtor û Nûçegihanên Ajansa ANHA'yê ji rojnemeya me re axivîn.

Edîtorê Ajansa ANHA'yê Sîpan Silo diyar kir ku şehîd Îsam Ebdullah ji bo ragehandina heqîqetê gihişt asta şehadetê û wiha got: "Di kesayeta rojnamegeriyê de şehîd Îsam Ebdullah ji bo dengê civaka xwe û rastiya dijmin ragihîne cihanê gihîşt asta şehadetê. Şehîd Îsam bi hemû hêza xwe ji bo gihandina rastiyê ji civakê re kar û xebat dida meşandin. Bi kamêre û pênûsa xwe rihê rojnamegeriya azad temsîl dikir. Helwestên wî yên li ser kar û xebatê, herwiha hewldanên wî yên ji bo zêdebûna pêşketina di warê rojnamegeriyê de ew kir rojnamevanekî serkeftî."


Sîpan Silo


Rênas Remo


Kemal Necim



**'Em soza berdewamkirina riya heqîqetê didin'**

Sîban Silo di dawiya axaftina xwe de soza şopandina riya şehîdên çapemeniya azad da û wiha got: "Şehîd Îsam beriya şehadeta xwe gelek bîranîn ji me re hiştin, ji ber ku ew nûçegihanê Dirkê bû û ez jî edîtorê navenda nûçeyan bûm û di derbarê xebatê de em di nava peywendiyên berdewam de bûn. Têkiliya me bi hevaltiya ku li ser rêzgirtinê hatiye avakirin, bû. Evîna ku wî li dû xwe hiştiye di giyanên her kesê ku wî nas kiriye, têkiliya wî ya xurt bi derdorên xwe re û hezkirina wî ya ji wan re jî nîşan dide. Em di yekemîn salvegera şehadeta Îsam de wî û hemû şehîdên çapemeniya azad bi rêzdarî bi bîr tînin. Em dûbare dikin ku hemû peymanên navneteweyî piştrast dikin ku hedefgirtina rojnamegeran sûc e û divê berpirsên wê bên cezakirin. Her wiha em soza berdewamkirina rêya heqîqetê bi şehîdên ajansa me; şehîd Îsam, Hogir, Rizgar û Dilîşan nû dikin."

**'Şehîd Îsam tû carî nayê jibîrkirin'**

Di heman çarçoveyê de Nûçegihanê Ajansa ANHA'yê Rinas Ramo jî da zanîn ku wî şehîd Îsam Ebdullah ji nêz de nas dikir û wiha got: "Şehîd Îsam di nava hevkarên me yên kar de dihat hezkirin, dilê wî ji bo xebatê lêdixist û hertim hewl dida ku medyaya Kurdî pêş bixe û ji civaka xwe nêz be. Her dem hewl dida ku kamere û pênûsa xwe bixe xizmeta civaka xwe. Şehîd Îsam fedakarê civaka xwe bû û ji bo me mînak bû, şev û roj kar û xebat dimeşand. Şehîd Îsam bi rihê hevaltiyê dihat naskirin û tucarî nayî jibîr kirin."

**'Şehîd Îsam dilsozê gel û civaka xwe bû'**

Di heman mijarê de edîtorê Ajansa ANHA'ê Kemal Necim jî axivî û wiha got: "Rojnamevan Şehîd Îsam Ebdullah, berî her tiştî mirovekî dilsozê jiyanê bû. Dema mirovek dilsozê jiyanê be, bê guman wê rêzê bide hemû regez û hêmanên jiyana xwe û jiyana derdora xwe jî. Dema ku hîna ciwan bû, li zanîngiha Şamê dixwend, ew dilsozê malbata xwe bû û ji bo ku barê malbatê sivik û carna jî alîkariyê bike wî di ber xwendinê xwe de kar dikir. Ew her dem dilsozê gel û civaka xwe bû."

**'Şehîd Îsam bû pêşengê qada rojnamevaniya azad'**

Kemal Necim di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Dema ku Şehîd Îsam dest bi karê rojnamevaniyê kir, ew kar ji bo wî qadeke nû bû, ji bo ku di karê xwe de serkeftî bibe hin regez pêwîstbûn, mîna dilsozî, xwestek, vîn û ked, ev jî taybetmendiyên şehîd Îsam bi xwe bû. Lewma di demeke kurt de fêrî kar bû, her wiha bû sozdarê pêşengên qada rojnamevaniya azad. Her dem ew li cihê pêwîst bû û rastî radigihand. Bi heval û derdora xwe re jî dilsoz bû, ji wan fêr dibû û ew fêr dikirin."

# Rêxistina Sara: Em ê roja 25'ê Mijdarê bigihînin armanca wê

**Zana Roj/ Şehba**

**Bi nêzîkbûna 25'ê Mijdarê Roja Cîhanî ya Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinê tevahiya rêxistinên jinan li bakur û rojhilatê Sûriyê dest bi çalakiyan kirin. Rêxistina Sara li herêma Şehbayê tekez kir ku ew ê asta tîkoşîna li dijî tundiyê bilindtir bikin.**

25 ê Mijdarê weke rojeke cîhanî li dijî tundiya li ser jinê hatiye naskirin. Li hemberî zihniyet û piratîka tund ya ku ji sed salan ve li ser jinê tê meşandin, ev roj ji aliyê cîhana ku ew sedema vê tundiyê ye hatiye hilbijartin. Di vê rojê de tavahî rêxistinên parastina mafê jin, famînîst û jinên cîhanê dest bi çalakî û xwepêşandanan dikin. Tundiya li ser jin mijareke ku bi dîrokê ve girêdayî ye. Bi sedê salan jinên ku xwedawend bûn li ser dest hişmendiya rahib û sermayedaran rola wan di civakê hat tepisandin. Jin di bin destê serdestan de tenê bibû amûra zayînê. Roja 25 ê Mijdarê jinên cîhanê li hember netew dewlet û hişmendiya wê ya derheqê jin de rabûn ser piyan. Jinên ku rastî tundiyê dihat ji Xwîşkên Mîrabel de bigire û hemû jinên bindest serî li hember vê tundiyê rakirin û banga wekheviyê kirin. Li ser vî esasî ev roj weke rojeke cîhanî ya li dijî tundiya li ser jinê hatiye hilbijartin.

Têkildarî 25'ê Mijdarê endamên Rêxistina Sara a Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinê Zêneb Xelîl û Tekoşîn Mihemed ji rojnameya me re axivîn.

**'Rêxistina Sara li hermber hemû jinan xwe berpirisyar dibîne'**

Zêneb Xelîl di destpêkê de destnîşan kir ku Rêxistina Sara li hemberî tundiya ku li ser jinê tê meşandin hat avakirin û wiha got: "Li hember tundiya ku li ser jinê tê meşandin hemû cîhan di nava bêdengiyê de. Jinê ji bo berjewendiyên xwe bikar tînin û jin neketiya wê ferqê. Jin li her derê her deqê di çar aliyê cîhanê de tê kuştin, revandin, tecawîzkirin, işkencekirin û bikar anîn. Gelek rêxistinên parastina mafê jinê di cîhanê de hatine avakirin. Lê belê hîn jî civak ji zihniyeta xwe ya desthilatdar rizgar nebûye û jin dibe qurbaniya vê zihniyetê. Rêxistina Sara ku li bakur û rojhilatê Sûriyê hatiye avakirin, weke aliyeke fermî li hember tundiya ku li ser jinê tê kirin xwe berpirisyar dibîne û hemû xebatên tên kirin ji bo azadî û parastina mafê jinê ye. Herwiha Rêxistina Sara ji bo hemû jinên cîhanê têkoşîna li hember tundiyê dide meşandin."

**Di koçberiyê de diyardeyên tundiyê**

Zêneb anî ziman ku di rewşa koçberiyê û siyaseta ku tê meşandin de tundî li ser jinê zêdetir dibe û wiha domand: "Weke ku tê nasîn koçberî rê li ber gelek zehmetî û pirsgirêkên civakî û malbatî vedike, ne tenê di nava Kurdan de di giştî cîhanê de ev yek hatiye tesbîtkirin. Zehmetiyên jiyanê yê ku di asta yekemîn de di malbatê de tê kişandin, jin ya herî zêde dibe qurbaniya van zehmetiyan, di encamê de jin ji aliyê malbat, hevjî û civakê ve rastî tundiya laşî û ruhî tê."


Zêneb Xelîl


Tekoşîn Mihemed

**`Wê têkoşîna jina azad bê xurtkirin'**

Tekoşîn Mihemed jî diyar kir ku di sedsala 21'emîn de divê jin ji tundî û desteserkirinê bê rizgarkirin û wiha got: "Jin xwediyê hebûn û destkeftiyên dîrokî ye. Hebûna wê di civakê de nîşaneya herî xweş û watedayîna jiyanê geş dike. Li hemberî zihniyeta sedê salan û bi berdewamkirina xeta têkoşîna jinê, divê di sedsala 21'emîn de tavahî cureyên tundaiya ku li ser jinê tên pêkanîn bên redkirin û têkoşîna jina azad ya ji bo hebûna xwe bê xurtkirin."

**`25 ê Mijdarê divê bigihêje armanca xwe`**

Têkoşîn Mihemed bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Ji bo me her roj weke roja 25'ê Mijdarê tê dîtin. Divê hemû jinên azad yên xwedî helwest li hemberî tundiyê, têkoşînê bikin û her kêlî li hemberî zihniyeta ferzkirî bibin topeke ji agir û dîroka 25'ê Mijdarê bikin heqîqet."



# Pêwîste ku jin xwe ji sîstemê qut bike

Endama Komîteya Rêveber a PKK'ê Hêlîn Umît got, "Şert e ku jin ji sîstemê qut bibe û xwe bi rengekî cuda bi rêxistin bike. Jin çiqasî xwe xweser bike, ewqasî xwe, zayenda xwe nas dike, dibe xwedî îrade."

**Navenda nûçeyan**

Endama Komîteya Navendî ya PKK'ê Hêlîn Umît bi wesîleya 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Navneteweyî ya li dijî Tundiya li ser jinê axivî.

Di destpêka axaftina xwe de Hêlîn Umît Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan silav kir ku li hemberî sîstema komplo û qirkirinê ya Îmraliyê berxwedaneke bêhempa dimeşîne.

Umît anî ziman ku divê berxwedana li Îmraliyê û kiryarên li wê derê weke navenda bûyer û qewimînan bêne nirxandin, lewma rastiya Îmraliyê û rastiya Rêberê Gelê Kurd her tim di rojevê de bêne hiştin.

Hêlîn Umît salvegera 45'an a damezrandina PKK'ê jî li damezrînerê PKK'ê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pîroz kir.

Umît got, "Girîng e ku li dijî Navenda Qirkirinê ya Îmraliyê, li dijî sîstema qirkirinê têkoşîn bê meşandin. Pêwendiya vê yekê bi bilindkirina pîvana azadiyê heye. Li ser vê bingehê bang li her kesî dikim ku dema bê, di vê meha partiyê de sîstema li ser Rêber Apo rêberê azadiyê bişikînin."

**Tundiya li ser jinê di bingeha şaristaniyê de heye**

Endama Komîteya Navendî ya PKK'ê Hêlîn Umît bi wesîleya 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser jinê beriya her tiştî banga têkoşîna rêxistinbûyî li jinan hemûyan kir û got, "Cîhana em tê de veguheriye qadeke welê ku ji ber feraseta bi serweriya mêr jiyan lê zehmet bûye. Hema bibêje li her qada jiyanê tundî heye. Lê belê di navenda vê yekê de tundiya li dijî jinê heye. Analîzên dîrokî û civakî timî me dibe rojên destpêkê yên dîrokê. Em bala xwe didin ser wê yekê bê şaristanî, dewlet, desthilatdarî çawa ava bûne. Vê yekê dibînin; şaristaniyê xwe spart du tiştan û bi vî rengî ava bû. Bi serweriya li ser jinê ava bû û ev yek jî xwe dispêre derew û tundiyê. Tundiya li dijî jinê di bingeha şaristaniyê de heye. Bêyî tundiya li jinê şaristanî, dewletperestî, sîstema desthilatdarîperestî nabe. Ji ber vê yekê zayendîperestiya civakî di gotinan de jî heye. Gotinên, 'Divê tu ço li ser serê jinê kêm neke, dema serê xwe rakir divê tu lê bixe', ji bo wê yekê ne ku jin ti carî nebin ya xwe, timî bê xistin, timî bê birûmetkirin."

Hêlîn Umît anî ziman ku beden û hebûna jinê ya ku di destpêka mirovahiyê de weke pîrozmendiyê hate dîtin, bi şaristaniyê re veguherî tiştekî welê ku biçûk bê xistin, kêm bê dîtin û destnîşan kir ku di bingeha tundiyê de jî rastiyên bi vî rengî yên îdeolojîk, zayendîperestî hene.

Hêlîn Umît bi bîr xist ku jin li tevahiya cîhanê, bi taybetî li Rojhilata Navîn di nava şerekî giran de ne û wiha dewam kir, "Ji ber vê yekê di 25'ê Mijdarê de divê tundiya li ser jinê tê kirin, her wiha têkoşîna li dijî tundiyê hîn bêhtir di rojevê de bê hiştin. Ev yek jî ne tenê di rojekê de bê kirin. Bi rastî jî pêwîstiya me gelekî bi têkoşîna rêxistinbûyî heye. Pêwîstiya jinan bi wê yekê heye ku li hev kom bibin û dengê xwe bilind bikin.

Rabûna li ber sîstema milkiyetê ya heyî ji bo jiyana bi rûmet a jinê şert e. Bala xwe bidin ser; jin weke xwe nîne. Her tim a hinekan e. A hevserê xwe ye, a bavê xwe ye, a hevalê xwe yê mêr e. Her tim a mêrekî ye. Sîstema milkiyetê bi vî rengî ye. Niha partî jî bi heman rengî dikin. Yanî jin ên li nava AKP'ê her tim bi vî rengî ne. Yanî jin ne ya xwe ye. Ev tunekirin bi xwe çavkaniya herî mezin a tundiyê ye. Divê jin bibe ya xwe. Namûsa herî mezin ew e ku jin bibe ya xwe. Divê em bibin a xwe. Em jin divê xwedî li hev derkevin. Bavê me jî be, mirovekî ku em gelekî jê hez dikin jî be, mêrek jî be divê têkildarî jinê biryarê wernegirin. Divê jin bi xwe biryarê têkildarî xwe bidin. Rêya vê yekê jî qutbûna ji sîstema heyî ya bi serweriya mêr e.



**Şert e ku jin xwe ji sîstemê qut bike û bi rengekî cuda xwe bi rêxistin bike**

Şert e ku jin bi qasî jê tê xwe ji sîstemê qut bike û bi rengekî cuda xwe bi rêxistin bike. Jin çiqasî xwe bi rengekî xweser rêxistin bike, çiqasî li ser lingê xwe bisekine, ewqasî xwe nas dike, zayenda xwe nas dike, dibe xwedî îrade û dibe xwedî cihê hurmetê. Hezkirin û dilsoziya rasteqîn jî li ser vê bingehê li şûna xwe rûdinê. Lewma Rêber Apo got, 'Aştî çavkaniyeke hezkirinê ye'. Ev ne gotineke ku weke wêjeyê hatiye gotin. Ji ber vê hişmendiya azadiyê, felsefeya azadiyê tevgera me ya jinê ya PKK'ê ji aliyê cewherî ve bûye çavkaniya hezkirinê. Bêyî vê yekê rabûna li ber tundiya heyî nabe. Em qala rastiyeke welê dikin ku bûye mîna cinawirekî. Şaristaniya heyî ji her alî ve mêr e. Li her derê siyaset bûye karê mêr. Li nava artêşê ew serwer in. Ew diaxivin, ew diyar dikin. Barê sîstema mêtinger a kapîtalîst, barê şer hemûyan li pişta jinê dikin. Gelo jin wê vê yekê weke qederekê ji xwe re bibîne? Yan jî wê ji bo diyarkirina rêya xwe li hev kom bibe, xwe bi rêxistin bike û têbikoşe? Em dibêjin me bi rengekî bingehîn rêya vê yekê ava kir. Yanî weke PAJK'ê me ji jinên cîhanê re rêyek danîn, bûn mînak û modelek. Di serî de jinên li herêmê em bang li jinan hemûyan dikin ku vê mînakê, vê pêşengiyê baş nas bikin, bi rengekî rast tevlî bibin û li dijî sîstema bi serweriya mêr têbikoşin."

# Zarokên Kurd ên ji aliyê dewleta Tirk ve hatin kuştin

**Desthilatdariya AKP-MHP'ê Tirkiye û Kurdistan kir welatekî welê ku dayik û bav zarokên xwe yên ji ber terora dewletê hatin kuştin veşêrin.**

20'ê Mijdarê Roja Mafên Zarokan a Cîhanê ye. Mafên zarokan ew mafên ji dema jidayikbûnê destpê dikin ku bi qanûnî û exlaqî ji bo hemû zarokan hatine naskirin. Mîna mafên perwerde, tenduristî, jiyanê, stargehê. Zarokên Kurd jî diviyabû xwedî vî mafî bûna, lê belê di dema Komara Tirkiyeyê ya 100 salî de û desthilatdariya AKP-MHP'ê ya 22 salan de xaka Kurdistan û Tirkiye ji bo zarokên Kurd bû goristan. Di serî de di qirkirinên Zîlan û Dersimê de bi deh hezaran zarokên Kurd hatin qetilkirin. Di desthilatdariya AKP'ê de jî di serî de li Roboskî li Kurdsitanê bi sedan zarokên Kurd ji aliyê hêzên dewletê ve hatin qetilkirin.



**Erdogan zarokên kurd hedef nîşan da**

Dewleta Tirk ji bo kuştina zarokên Kurd ti carî xwe neda alî. Erdogan sala 2006'an di axaftineke xwe de got, "Jin jî be, zarok jî be li wan neyên rehmê". Piştî vê gotinê, kuştina zarokan êdî bû kiryarên ji rêzê. Ev gotinên Erdogan bû polîtîkaya dewletê. Zarokên Kurd bi rengekî yekser hatin qetilkirin. Di dema AKP'ê de ku bajarên Kurdan veguherand mîna leşkergehê, her wiha bi wesayitên leşkerî jî zarokên Kurdan hatin qetilkirin. Li gelek bajarên Kurdistanê bi lêdana wesayitên zirxî bi dehan zarokên Kurd hatin qetilkirin. Li gorî daneyên Şaxê Amedê yê Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) di nava 15 salan de li bajarên Kurdan 21 zarokan bi lêdana wesayitên zirxî jiyana xwe ji dest dan, 23 jî birîndar bûn.

Li gorî daneyên Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) di navbera salên 2004-2015'an de herî kêm 241 zarok ji aliyê polîs û leşkeran ve hatin kuştin. Li gorî daneyên rêxistinên civakî yên sivîl jî di heman demê de 477 zarok ji aliyê dewletê ve ahtin kuştin. Kujerên zarokên Kurd jî li şûna cezakirinê hatin xelatkirin, payeya wan hate bilindkirin.

Çend ji zarokên ku di dema desthilatdariya AKP'ê de ji aliyê hêzên dewletê ve hatin qetilkirin bi vî rengî ne:

"Uğur Kaymaz (12 salî)
Zilan Demir (8 salî)
Şilan Demir
Mizgin Demir
Evin Dilan Demir
Nazar Çetinkaya
(2salî)Nazlı Çetinkaya
(4 salî)
Abdullah Çetinkaya (9 mehî)
Hasan Marangoz (14)
Abdullah Duran (9)
Enes Ata (8)
İsmail Erkek (8)
Mart: Fatih Tekin (3)
Ahmet Araç (17)
Mahsum Mızrak (17)
Emrah Fidan (17)
Mizgin Özbek (1)
Abdülsamet Erip (14)
Maziye Aslan (8)
Ceylan Önkol (12)
Mehmet Uytun (18 mehî)
Mehmet Nuri Tamçoban (1)
Oğuzcan Akyürek (13)
3'ê Hezîranê: Diren Basan (14)
Berkin Elvan (15)

**Navê zarokên ku di Komkujiya Roboskî de hatin qetilkirin:**

"Özcan Uysal (18)
Celal Encü (15)
Erkan Encü (13)
Adem And (15)
Mehmet Encü (1)
Şervan Encü (16)
Cemal Encü (16)
Şıvan Encü (14)
Bilal Encü (15)
Mahsum Encü (16)
Salih Encü (17)
Serhat Encü (17)
Savaş Encü (15)
Çetin Encü (12)
Bedran Encü (12)
Hüseyin Encü (18)
Aslan Encü (15)
Orhan Encü (15)
Fadıl Encü (16)
Vedat Encü (16)
Cihan Encü (16)
Erkan Encü (13)." **ANF**

# ‘Hemas li gorî berjewendiyên dewleta Tirk û Îranê tevdigere’

Hevserokê Partiya Kesk a Demokrat, Luqman Ehmê da zanîn ku Pirojeya riya aborî ya Hind- Ewropa ku di Israyîlê re derbas dibe nakeve xizmeta berjewendiyên aborî yên dewleta Tirk û Îranê de û ji bo ku rê li pêşiya wê bigrin Hemas weke amûrekê bikar anîn.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Şerê di navbera Îsrayîl û Hemasê de ku ji 7’ê Cotmeha derbasbûyî de dest pê kiribû berdewam e, têkildarî vî şerî û herwiha bandora wê li ser rewşa Sûryê û Rojhilata Navîn, hevserokê Partiya Kesk a Demokrat, Luqman Ehmê bersivê pirsên rojnameya me da. Naveroka hevpeyvînê jî wiha ye:

**Çima şer di navbera Hemas û Israyîlê de rûda û li gor we çareserî ji bo rawestandina vî şerî çi ye?**

Dema ku em li Rojhilata Navîn meyze dikin, gelek pirsgirêk tên dîtin, ev herêm dagirtî pirsgirêk e. Ev pirsgrêkên ku li Rojhilat çêdibin, têkildarî rewşa aborî, civakî, siyasî ne û ji dema ku dewletên nû li herêmê hatine avakirin û pêre jî gelek tevger, partî û rêjîmên derketine ev pirsgirêk li cihê xwe mane û heta îro jî çareser nebûne. Nimûne ji vê yekê jî kiriyarên Hemasê li Israyîlê, em Hemasê weke tevgereke tundrew dibînin û ev tevger temsîla gelê filestînê nake. Gelê israyîlî û hem jî yê filestînî gelek ziyanên canî dîtin weke têzanîn bi hezaran kesên sivîl hatin kuştin



û revandin. Em hedefgirtina van kesên sivîl bi tundî şermezar dikin. Hemas weke destekê Tirkiyê û Îranê ye û li gor van herdû rejîman tevdigere, sedema sereke jî ew e ku berjewendiyên Îran û Tirkiyê pêk bînin. Pirojeya Aborî ku wê di herêmê derbasbûbaya re di Lûtka Girûpa 20’an de hate lidarxistin. Di encamê de hat pêşinyarkirin ku wê riyeke aborî di herêmê re derbas bibe. Ev rê ji Hindê dest pê dike, herwiha derbasî Girava Erebî dibe, diçe Israyîl û bi riya Deriyaya Spî derbasî Ewripayê dibe. Bi vî awayî ev riya aborî di Îranê û dewleta Tirkiyê re derbas nabe û herdu dewlet ti fêdeya ya aborî jê nabînin. Lewma xwestin tevlîheviyekê di hundirê Israyîl û Filestînê bidin avakirin û rê li ber vê riya aborî bigrin. Hin riyên çareseriyê di asta heremî de ji bo pirsgirêka Hemas û Israyîlê hene, lê ne Hemasê û ne herdu rêjîmên Îran û Tirkiyê dixwazin ev pirsgirêk çareser bibe ji ber ku nakeve xizmeta wan.

**Ev bûye bêtirî mehekê ku şer di navbera Israyîl û Hemasê de li dar e, çi bandora vî şerî li rewşa Sûriyê û Rohilata Navîn heye?**

Wekî min destpêkê anî ser ziman şerê ku îro di navbera Isayîl û Hemasê de li dar e, ji ber pirojeya riya aborî ya cîhanî ye. Kirîza Sûriyê ya ku ji 2011’an de dest pê kiriye jî ji ber vê pirojeya aborî ye. Riyên aborî ji Dewletên Xelîc di erdîngariya Sûrî û Îraqê re derbasî Ewripayê dibû. Lê piştî kirîza Sûriyê û aloziyên Îraqê dest pê kirin, tevgera riyên aborî yên ku di herdu dewletan re diçûn, rawestiyan. Di heman demê de van dewletên ku zerer ji girtina van riyan dîtin, neçar man ku dest pirojeyek din bikin. Ev piroje jî riya aborî ya ku ji Hindê tê Girava Erebî û bi riya Israyîl derbasî Ewripa dibe, ye. Dewleta Tirk dereng ma heta ku pilanên vê pirojeyê kişf kir, lewma ji bo ku dîsa van riyên aborî vegerîne xebatê têkiliyên xwe bi Rûsiya û hwd… re xurt kirin. Heta ku Kirîza Sûriyê çareser nebe, ev riyên aborî yên kevin wê nekevin tevgerê. Çareseriyeke ku encamên wê ne mîna rewşa gelên Sûriyê ya berî salên 2o11’an be. Lê belê divê gelên Sûriyê û hikumeta Şamê baweriya xwe bi çareseriya navxweyî bînin. Di heman demê de mafê hemû pêkhatiyên wê bi giştî parastî be.

**Erdogan xwe weke piştgirê gelê filestînî dibîne û li nerazîbûna xwe ji ber kiryarên Israîlê tîne ser ziman, lê ji bo berjewendiyên xwe têkiliyan bi Israyîlê re qut nake, di heman demê de êrîşî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike, hûn dirûtiya Erdogan çawa dinêrxînin?**

Erdogan di aliyê diblomasî, aborî û leşkerî de têkiliyên wî yên xurt bi Israyîlê re hene. Herwiha firokvanên Israyîlê timî tên Tirkiyê û perwerdeya xwe li wir dibînin, hem jî kar û barên teknîkî bi hevpariyekê didin meşandin. Dewleta Tirkiyê çek û amûrên şer yên herî pêşketî bi alîkariya Israyîlê werdigre. Di heman demê de tê destnîşankirin ku salane zêdeyî 10 milyarên dolarên emerîkî di encama têkiliyên aborî û bazirganiyê de di navbera van herdu dewletan de çêdibin. Lê dema axaftinê jî giriyê xwe li ser Hemas û gelê filistînî tîne, di heman demê de jî têkiliyên xwe yên cihêreng bi Israyîlê re dide meşandin. Kesayetên wiha sextekar in û ola mislimantiyê ji bo berjewendiyên xwe bikar tînin, Erdogan heta asteke bilind jî bi gotinên xwe dikare bandorê li mislmanan û hestên wan bike. Ew ji bo berjewndiyên xwe yên cuda Hemasê û li ser hesabê mislimantiyê bi kar tîne û destekê dide Hemasê. Lê ew gelekî dûrî ola mislmantiyê ye, eger wisa rast e, vaye gelek kurdên mislman li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hene. Lê bi domdariya Şoreşa Rojava re dewleta Tirk a dagirker kiryaran li ser gelên herêma me û bi taybet li ser gelê kurd dimeşîne. Di sala 2018’an de dewleta Tirk êrîşî Efrînê kir û gelek kesên sivîl dan kuştin, heta roja îro kiryarên kuştin û guhertina demografîk di derheqê gelên wê de pêk tîne. Herwiha ev çar sal in ku ev dagirkerî Stasiyona Elok ya kontrol dike û avê li ser misilmanên kurd û ereb yên kantona Hesekê qut dike. Ev kiriyarên ku dagirkeriya Tirkiyê li ser gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tîne tê wateya ku ew li dijî mislmantiyê ye, lê mislmantintiyê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne.

# Sedema krîza di navbera Îsraîl-Filistînê de çi ye; çawa çareser dibe?

**Volqan Elî**

Em di serî de bêjin di mijara pirsgirêkên civakî de, pêşniyar yan jî rêyeke çareseriyê ya misoger (wekî lîsteya dermanên ku doxtor ji bo nexweşên xwe dinivîsin) salox dayin bi temamî rast nabe. Ev nayê wateya ku mirov li ser pirsgirêkên civakî fikra xwe nebêje, proje-ezmûnên ji bo civakê sûda wan hebûye wê hebe jî, nikare bîne ziman.

Bi kurt û kurmancî mijar û pirsgirêk; hişmendiya dagirkerî, netewe-dewlet û neteweperstiyê ye…

Di dawiya sed sala 15. û destpêka sed sala 16. Ji aliyê Ewrûpayê ve qaşo Emerîka û Awustralyaya cezîre hate kişifkirin. Bi milyonan gelên wekî Aztek, Înka, Maya, Aborjîn ji dîrokê wekî gel hatin rakirin. Sedema wê çi bû, kî bû, kê jê sûd wergirt? Dagirkeriya Ewrûpa û kapîtalîzma ku nû peyda kiriye. Heya bi dawiya şerê cîhanê, bi milyona Yahûdî ji aliyê netewe-dewleta faşîst a Almanan ve hate kuştin. Çima? Hîtler digo, ‘ev çend sed sal in dewleta Alman ji ber hevkariya Yahudiyan bi dijmin re têk diçê, ji bo saxlemiya dewleta Alman divê Yahûdî nemînin’. Bi milyonan tev bi gazên kîmyawî xeniqandin. Sedem çi bû, kî bû? Netewe-dewleta Alman…

Di kela kela germa şerê cîhanê de, çend salan ji beriya wê dewleta Tirk (Osmanî û paşê jî Tirkiye li ser Kurdan) biqasî 1,5 milyon Ermen ji ser welatê wan mişaxtî kirin. Hemû li ser rêyên koçberiyê yan hatin kuştin yan jî mirin. Îro jî dewleta Tirk ya niha vê jenosîdê qebûl nake. Jixwe nake, eger ne ji împaratoriyê bûya wê Mistefe Kemal ev kar bikira… Her hal wisa difikire; ‘baş bû împaratoriyê ev kar kir. Jixwe min ê Kurd biqelandana. Wê demê barê min girantir dibû’.

Di hemû eniyên vî şerî de Kurdan li hemberê emperyalîzma Ewrûpayê şer kir. Tirkiye (Misto Kor-Înonu) çû li Ewrûpayê pesna xwe da û li Lozanê Kurdistan kir çar parçe.

Kurdan got “dijmin e, bê minet e. Rom a reş , bê bext e”. bi pêşengiya Şêx Seîdê kal, Seyîd Riza û çendîn rêberên gorbihuştî daketin qada cengê. Bi dehan sal agirê berxwedanan sar nebû. Lê dara Kurdan ji mêj de kurm ketibûyê. Seyîd û Pîr yek bi yek daliqandin. Bi sed hezaran Kurd di serê sungiyên leşkerên Misto Kor (gelê Dêrsimê jê re wisa dibêje) de canê xwe dan. Bi hezaran di şikeftan de bi dermanên mişkan hatin xeniqandin. Li welatê Kurd û Ermenan kundê netewe-dewletê Tirk bû serwer. Niha Erdoxan her cara ku nimêj dike, li şûna salawatê dibêje ‘yek dewlet, yek ziman, yek al, yek watan’. Besmeleya netewe-dewletê vaye ev e. Sedema xwîna bi milyonan Ermen û Kurd çi bû, kî bû? Çawa ku bi roj, rok li azmanan aşkere û zelal xuya dibe bersiv jî zelal e.

Serpêhatiya gelên Emerîkî (Çermsorik), Ermen û Kurd tenê sê mînakên herî balkêş bûn. Ne ku hema di dîrokê de çi bûye ew e. Ji derketina şaristaniyê vir de belkî bi milyaran mirov di şerên neheq ên emperyalîst û dagirker de mirine. Dîsa pirsgirêkek herî girîng ku zêhniyeta netewe-dewlet dibe sedem jî pirsgirêka Îsraîl-Filistînê ye. Ev, pirsgirêkeke dîrokî, û aliyê wê yê olî heyî ye jî. Lê tevî van hemûyan jî ji ber nêzîkbûna neteweperestî çareser nabe, her diçe girantir dibe. Di dîrokê de kengî pirsgirêk nêzîkî çareseriyê bû? Dema ku rêxistinên Filistînî yên demokratîk û xwe dispêrin gerîla bi hêz bûn di sed sala 20’ê. de, rewşeke wisa hebû. Pergala kapîtalîst a cîhanî ji bo ku vê ji holê rake bi taybetî HAMAS bi Îsraîlê da avakirin. Di encamê de hemû rêxistinên pêşverû-şoreşger hatin tasfiyekirin. Li şûnê ma HAMAS. HAMAS jî hewl dide bi rêbaza Îsraîlê, pirsgirêkê çareser bike. Di şevekê de bi ser gelê Yahûdî de girt bi sedan jê kuşt. Çi bû? Îsraîl li benda vê bû. Niha li ber çavê hemû parazvanên mafên mirovan û hemû mirovahiyê bi roj û şev bi sedan Filistînî dikujin. Di weşana zindî de bi çekên ecêb û nehatiye dîtin, avahiyên deh tebaq tîne xwarê. Wijdan û exlaqa hemû temaşevanên tv’yan, dixe bin erdê û derdixe. Êdî ev şer bû şerekî ku pê exlaq û wijdanê civakan tê tinekirin. Tenê ne şerê Îsraîl û HAMAS’ê ye.

Ma ev çareserî ya Îsraîlê ye, yan jî ya HAMASê ye? Kî dikare bersiva vê pirsê bide? Erdoxan… Putîn... HAMAS… Neten Yahu…? Ez ji we re bêjim: Ev, çareseriya Îsraîlê ye, çareseriya HAMASê ye… Çareseriya netewe-dewletê ye… Çareseriya Erdoxan e. Çareseriya hemûyan e. Ma çima Erdoxan xwedî li HAMASê derdikeve, Yê din jî li Îsraylê… Erdoxan ne ji ber ku pir ji gelê Ereb hez dike, wisa dike. Eger wisa bûya her roj li ser serê Erebên Serêkaniyê, Til Temirê û tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriye bombe nedibarand.

Wê demê ma çareserî çi ye? Çare: Mînaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Çare: Ne ji bo her neteweyekê dewletek, ji bo her neteweyekê al, welat û zimanek… çare: Neteweya demokratîk e, yanî hemû netewe, hemû ol, hemû ziman, hemû nirx û qîmet bila bi hev re, di nava aşitiyê de bijîn. Ma ti kes dikare bêje ‘ev fikreke xirab e, ji bo me ne baş e?’



# Ronahî TV bû dengvedana şoreşê û çavkaniya baweriyê

Di 21’ê Mijdara 2012’an de Ronahî TV dest bi weşana xwe kir û damezrandina yek ji kenalên satelaytê yên navdar di warê şopandin û ragihandinê de 12 sal temam kirin. Ji destpêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê û heta niha, Ronahî TV erka ragihandina pêşketin û heqîqeta şoreşê ji cîhanê re girtiye ser milê xwe. Tevî hemû êriş û zextan jî Ronahî TV bi keda karmendên xwe bûye dengê civakê û şoreşa gelan.

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Qenala Ronahî TV ji roja damezrandina xwe û heta roja îro gelek pêngavên giring bi dest xistiye. Herwiha Ronahî TV bûye dengê projeya neteweya demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û dengê şoreşa Rojava û gelê wê û rastî ji raya giştî ya cîhanê re hertim ragihandiye. Li piraniya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê şaxên Qanala satelaytê hene û bi xebateke ragihandinê û teknîkî ya ku zêdetirî 100 kesî pêk tê. Ronahî TV ji bo gihandin û rgihandina dengê şoreşa Rojava, pêşketin û geşedanên li Rojhilata Navîn ji hemû cîhanê re kar û xebatê dide meşandin.

Herwiha girêdayî vê yekê platformên dîjîtal ên mîna twitter, Youtube û Facbookê nîşaneya vê yekê ne. Lê tevî êriş û hewldanên astengkirinê jî Ronahî TV her bi biryar bû ku bibe deng û çavê herêmê, li gel ragihandina nûçeyên ji eniyên şer û berxwedanê, Ronahî TV ti carî pirsgirêkên civakê paş guh nekirin e, li gel guhdar kiriye, gilî û gazinên wan ragihandiye aliyên peywendîdar da ku ji pirsgirêkan re riya çareseriyê bê dîtin, ji ber vê yekê ew bû hêviya gelê Rojava.

Di derbarê salvegera Televiziyona Ronahî TV de Pêşkêşvan û Edîtorê Navenda Nûçeyan a Ronahî TV Serdar Goyî û rojnemevana Ronahî TV Raperîn Elî ji rojnameya me re axivîn.

Serdar Goyî diyar kir ku Di wextekî de ku herêm di nava guherîn û veguherînê de ye, xebatên çapemeniya azad hertim xwedî girîngiyekî sereke ye û got: “Me Ronahî TV di destpêka ku bihara gelan li nava Sûriyê belav dibû de avakir û me rastiya şoreşa gelan ji xwere weke pîvana sereke destnîşan kir û pîvana bingehîn hevgirtina gelan bû. Ev yek di nava ewqas televziyonên xwedî ezmûn û alîgiriya fikrê deshilatdariyê dikir, de ne hêsan bû. Li aliyekê li pey rastiya bûyerê ketin û li aliyê din jî avakirina baweriya bi hêza gel mîna du xalên sereke hatin destgitin. Her wiha li ser xakek ku bi ti awayî qala azadiya fikir û ramanê nedihat kirin, avakirina telvziyonek ku bibe dengê şoreşê qet hêsan nebû. Ji aliyekê ve kêmderfetî, ji aliyê din ve jî zexta hikumeta Şamê û tirsa di serê civakê de hatî rûniştandin bandora xwe li kar û xebata Ronahî TV dikirin. Di weşangeriya xwe ya salên despêkê de, bi zimanê Kurdî, Erebî, Îngilizî û Fransî weşan dihat kirin. Lê para herî sereke ji bo Zimanê Kurdî û Erebî bû. Sedemê wê yekê jî ew bû ku girseya li me temaşe dike berfireh bû.”

**‘Ronahî TV li herêmê bû çavkaniya ragihandina rastiyê’**

Serdar di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Ji Mijdara 2011’an ve, di qada têkoşîna çapemeniya azad de em cihê xwe digrin û hertim me hewildaye ku ragihandina rastiyan bi raya giştî re parvebikin. Niha ji bo me bi qasî parvekirina agahiyan bi civakê re, çêkirina baweriya civakê ya bi hêza xwe û bi ragihandiyê re jî pêwîste. Dema me ev yek dikir, hewildanê me ew bû ku hêviyên gelê Kurd yên li beşên din ên Kurdistanê jî li ber çavan bigrin. Bi taybet jî, Bakur û Rojhilatê Kurdistanê ku êdî bi çavekî tijî hêvî li Rojava dinêrin. Bi qasî bînerên Ronahî Tv yên li Rojava, qat bi qat bêtir li beşên din yên Kurdistanê û diyaspora derveyî welat heye. Her wiha Di televziyonê de, karanîna ziman jî bi serê xwe mijareke din a herî hesas e. Ji ber armanca me ya di dema ragihandina bûyeran de, ne reşkirin, lê hevgirtina gelan e. Ticarî me di siyaseta xwe ya weşanê, ziman û rêbazê reşkirin û piçûkkirina civakê bikarneaniye. Li cihê zimanê kuştin û wêraniyê, her tim me zimanê çêkirin û avakirinê bikaraniye. Weke Ronahî Tv ji ber li ser erdê li cihê bûyerê ye, bawerî û gotinên dihatin kirin xwedî bandor bûn. Di tevahî pêngavên rizgarkirin û parastina herêmê de ji êrişên tundrew de, li cihê bûyerê rastî ragihand. Nebûna xebatkarên çapemeniyê dibû sedem ku zehmetî derbikevin holê. Ev zehmetî bi dilxwazên xwegihandina rastiyê di demekî kin de were derbas kirin. Ronahî Tv li herêmê hem bi erka xwe ya xwegihandina agahiyan û ragihandina wan radibû, li kêleka vê yekê jî ew mîna zanîngeheke avakirina xebatên dîtbarî li Rojava bû.”

**‘Ronahî TV rolek sereke leyîst’**

Serdar Goyî da zanîn ku yek ji erkên televziyonan perwerdekirina civakê ye û got: “Dema Ronahî Tv dest bi weşangeriya xwe kir, ev xal jî bi girîngiyek zêde li ber çavan hate girtin. Ji ber civaka weşangeriya ji bo wê dihat kirin bi sedê salan e bi pişaftinê re rûbirû mabû. Ji ber vê yekê di destpêkê de dayîna fikrê azad û perwerdekirinê xwedî giringiyeke taybete bû û ev yek weke pîvaneke sereke bû. Destpêkê bi qasî bernameyên Siyasî û bernameyên çandî, perwerde, rêxistinî û fikrî di weşanê de cihê xwe digrtin. Ev dihişt ku bi rêya van beşan civak rastiya xwe û planên bi serê wan hatine gerandin bizanin û nasbikin. Perwerdeya bi zimanê dayîkê û balkişandina li ser vê yekê xebatek sereke bû. Dema mirov li asta zimanê Kurdî dinêre, bi rengekî herî baş bandora telvezyonê li ser civakê dayî avakirin dibîne. Li kêleka vê yekê jî, çand û rêxistinbûna civakê jî bi bernameyên sereke yên dihatin weşandin ev rastî bi rengekî herî baş raberdikir. Di danasîn û ragihandina rastiya xeta Sêyemîn a ku Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser dimeşe, Ronahî Tv roleke bi bandor û sereke lîst.”

Serdar Goyî pêşkêşvanê Ronahî Tv wiha axaftina xwe bi dawî kir û got: “Ev 13 sal ji kar û xebata Ronahî TV tijîdibin û di nava vê demê de, hevrêyê me Mustefa Mihemed dema şopandina pêngava Rizgakirina Minbicê şehîd bû. Herwiha Hevalê me Ehmed Koçer û Ehmed Esed yê di xebata pêşxistina televziyonê de û gihandina rastiyan de bi hemû hêza xwe kar dikirin, jiyana xwe ji destdan, em van hevrêyan bi minetdarî bibîr tînin. Mîrasê me ji Gurbetelî Ersoz û şehîdê me yê çapemeniyê Seyîd Evran girtî, em ê, ji bo gihandina serkeftinê bimeşin.”

**‘Ronahî TV bû dengê şoreşa Rojava’**

Girêdayî heman mijarê Raperîn Elî diyar kir ku 12 salên tijî xebat li pey xwe dihêlin û bi xurtî û bi biryardarî ji bo ronîkirina rastiyan ew, derbasî sala 13’an dibin. Dengê şoreşa Rojava Ronahî TV ye û got: “Ronahî TV bi zehemetî û derfetên kêm dest bi kar û xebatê kir, îro jî bûye çavkaniya ragihandina nûçe û bûyerên li herêmê ye. Hemû pêvajoyên ku herêm tê re derbas bûn, Ronahî TV kêlî bi kêlî belge kir û şopand. Bi saya xebatên Ronahî TV, cîhan ji destkeftî, serkeftin û zehmetiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê agahdar dibe. Xebatkarên Ronahî TV tevî hemû êriş û astengiyan gav şûnve navêtin û hemû astengî derbas kirin. Ked û rola kedkar û xebarkarên Ronahî TV di nava şoreşê de yek ji nimûneyên ber bi çav e. Her wiha bi kamîre, nûçe û bernameyên xwe, Ronahî TV berxwedana gelê li herêmê û ji milekî din ve jî hovîtiya dagirker û komên çete radighand, lewma xebatkarên Ronahî TV gelek caran bûne armanca êrişên komên çete û dewleta Tirk. Ronahî TV rastî êrişên qaşo saziyên ragihandinê yên cihanî ne jî hat û bi girtina malperên televizyonê xwestin bondora wê kêm bikin.”



Serdar Goyî



Raperîn Ali

**‘Emê heya dawiyê şopdarê heqîqetê bin’**

Rojnemevana Ronhaî Tv Raperîn Elî wiha axaftina xwe bi dawî kir û got: “Tevahiya 12`e salên derbasbûyî, di berdêla ragihandina rastî û heqîqetê de, li ser erdê û rêya şopandina heqîqetê, nûçegihanên Ronahî her di nava bûyerên zindî de bûn û di vê oxira wê de şehîd bûn. Li eniya şer a Minbicê Nûçegihanê Ronahî TV Şehîd Mistefa Mihemed yek kêliyê xwe neda paş û ji bo ragihandina rastiya şoreşê û berxwedanê şehîd bû. Bê guman ev yek ne tenê taybetmendiya xebatkarên Ronahî TV ye, her wiha yên hemû dezgehên ragihandina azad li Rojava li ser vê şopê ne. Tenê ji bo rasita şoreşa Rojava bi cîhanê re parve bikin, heta niha gelek nûçegihan û xebatkarên ragihandina Azad şehîd bûne. Em wekî rojnemevanên Ronahî Tv heya dawiyê em ê, bi pênûs û kamereya xwe dengê gelê xwe ragihînin cîhanê û em ê heya dawiyê şopdarê heqîqetê bin.”



## Qedexekirina PKK’ê

**Farûk Sakik**

Di 18’ê Mijdarê de li Berlînê li dijî qedexeya PKK’ê ya li Almanyayê meş û mîtîng hebûn. Di ser qedexeyê re 30 sal derbas bûn. Kurd 30 sal e bi israr ji bo ev qedexe were rakirin têdikoşin. Lê israra dewleta Alman a qedexeyê jî dewam dike.

Her tişt di 24’ê Cotmeha 1989’an de li Dadgeha Eyaletê ya Dusseldorfê bi doza ‘Dadgehên Dusseldorfê’’ dest pê kir. Ev jî weke ‘doza herî mezin a siyasî’ derbasî dîroka Almanyayê bû. Ji 18 kesan 15 jê girtî dihatin darizandin. Çima ev doz hat vekirin. Di wan salan de li cîhanê guhertinên mezin çêdibûn. Piştî hilweşandina rejîma Sovyetan, lêgerînên cuda derdiketin pêş.

Gelek tevger û rêxistinên çepgir-sosyalîst hêdî hêdî diheliyan.

Rêxistinên ku ji Tirkiyê ji ber darbeya 12’ê Îlonê hatibûn Ewrûpa ew jî êdî ne xwedî hêz bûn. PKK’ê berevajî van tevger û rêxistinan roj bi roj dibû xwedî hêzeke mezin. Gelê Kurd ku koçber bûbû, hatibû Almanyayê jî li dora PKK’ê diciviya.

Li gorî Rêber Apo destpêka ‘Komploya Navneteweyî’’ kuştina Olof Palme û darizandinên Dusseldorfê bû.

Piştî van dozan li Tirkiyê, PKK her ku diçû di nav civaka Kurdan de bû hêviyek. Li dora PKK’ê wek xelekek diciviyan.

Şerê çekdarî jî dest pê kiribû û dem dema serhildanan bû. Kurdên li Ewrûpayê jî parçeyek vê tevgerê bûn. Di qada navneteweyî de doza Kurdistanê roj bi roj belav dibû.

Kiryarên dewleta Tirk ên derveyî mirovahiyê, li navenda Ewrûpa dihatin ji aliyê van Kurdên li derveyî welat ve dihatin teşhîrkirin. Dewleta Tirk dixwest ku pêşî li vê bigire. Di demekî wiha de Almanya hat bîra wan û ji vê derê dest pê kirin.

Tansû Çîler serokwezîr bû û hatibû Almanyayê bi serokê demê yê Almanyayê Kohl re hevdîtinek pêk anîbû. Daxwazek wê hebû “qedexekirina PKK’ê.” Dewleta Alman a ku ji doza Dusseldorfê tu encam bi dest nexistibû, bi du hin delîlên sexte ket da ku PKK’ê krîmînal nîşan bide. Wê demê dozgerê taybet erkdar kiribû. Piştî van xebat û amadekariyan 26’ê Mijdara 1993’yan qedexeya li ser PKK’ê li Almanyayê hat ragihandin.

Sala 1993’yan ji bo wan manîdar bû. Di 1993’yan de PKK’ê jî agirbest îlan kiribû. Wê demê jî Tevgera Azadiya Kurd dixwest bi siyaset û dîplomasiyê pirsgirêka Kurdistanê çareser bike.

Ya ku dewleta Alman ditirsand jî ev bû. Şer bihata seknandin, aştî bihata herêmê, aramî çêbûya wê çekên xwe yên di stokê de çawa bazar bikirina.

Li ser daxwaza Almanyayê wê demê bersiv nedan agirbestê û destê Rêber Apo ê aştiyê li hewa ma. Kuştina Turgut Ozal jî parçeyek vê siyasetê bû. Û kê demê di navbera dewleta Tirk û Kurdan de hewldanên aştiyê û çareseriyê destpêdikirin, dewleta Alman, li Almanyayê êrişên li ser serê civaka Kurdan zêde kir. Ev yek ji aliyê Almanyayê ve pêk dihatin. Lê Tirkiye jî endamtiya xwe ya NATO’yê wek çekek bi kar danî. Her roj êrişî komel û saziyên kurdan dikirin. Festîval û çalakiyên çand û hunerî hatin qedexekirin. Welatparêz û siyasetmedarên Kurd bê hiqûqî hatin girtin û doz li wan hat vekirin.

Kurdên li Ewrûpa bi salan ji bo rakirina qedexeya li ser PKK’ê têdikoşin. Doz hatin vekirin. Serî li meqamên fermî hatin dayin. Kampanyayên îmzeyan hatin çêkirin. Dostên Kurdan ketin dewrê û hewldanên wan ên betalkirina biryarê hebûn. Lê dewleta Alman di vê biryara xwe de bi israr bû. Kurd jî di xwedîderketina PKK’ê de bi israr bûn.